

PÊKHATIN Û RÊNIVÎSA HOKER Û DESTEBÊJEYÊN HOKERÎ DI KURDÎYA KURMANCÎ DA

Zülküf ERGÜN

Zanîngeha Mardin Artukluyê Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî,
zxweshevi@gmail.com, <https://orcid.org/0000-0001-8784-56-36>.

Article Types / Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 01 Kasım 2023 **Accepted / Kabul Tarihi:** 20 Şubat 2024

Doi: 10.26791/sarkiat.1384595

Pêkhatin û Rênivîsa Hoker û Destebêjeyên Hokerî di Kurdiya Kurmancî Da

Kurte

Destnîşankirina rêzikên rênivîsê ji bo cihgirtina zimanê nivîskî û standardkirina zimanê yek ji karên girîng ên plandanîna zimanê ye. Di kurdiya kurmancî da ev pêvajoyên hîn ji didome û gelek warên xam hene ku bi başî nehatine gengeşekirin. Mijara pêkhatin û rênivîsa hokeran û destebêjeyên hokerî yek ji van mijaran e. Em di vê xebatê da di bin sernavên bincureyên hokeran da hem envantera hokerên kurdiya kurmancî derdixin hem jî li ser pêkhatin û awayên rênivîsa wan radiwestin. Di destnîşankirina van hokeran da ji bilî çavkanîyên nivîskî yên kurdiya kurmancî, em bikaranînen herêmî û devokî jî li ber çavan digirin. Bi vî awayî piştî destnîşankirina awayên cîyawaz ên nivîsîna hokeran û destebêjeyên hokerî bi mebesta destnîşankirina awayê standard ê zimanê nivîsîne em pêşniyazên xwe dixin rû. Di dawîya vê xebatê da em digihîjin wê encamê ku bikaranîna gireyên tewangê, cîyawazîya bikaranînen herêmî û devokî û awayê nivîsa hokerên lêkdayî di rênivîsîna hoker û destebêjeyên hokerî da wek kêşeyên sereke derdikevin pêş.

Bêjeyên Sereke: Kurmancî, Hoker, Destebêjeyên Hokerî, Rênivîs, Rêziman, Standard.

The Formation and Spelling of Adverbs and Adverbial Phrases in Kurmanji Kurdish

Abstract

Determining the spelling rules of a language is one of the important elements of language planning for the standardization of that language. This issue is still an ongoing process in Kurmanji Kurdish and it is necessary to know that there are many issues that have not been addressed yet. The formation and writing styles of adverbs and adverbial phrases are one of these issues and have not been discussed properly. In this study, we categorize the adverbs in Kurmanji Kurdish under the subheadings of adverb types and focus on their formation and writing styles. In determining these adverbs, we take into account local and oral uses, apart from the written sources of Kurmanji Kurdish. In this context, after identifying the different writing styles of each envelope type, we offer our own solution suggestions in order to determine the standard usage in the written language. At the end of this study, it was determined that the use of inflective suffixes, regional and oral usage differences, and the writing styles of compound adverbs are important problems in writing adverbs and adverbial phrases.

Keywords: Kurmanji, Adverb, Adverbials, Spelling, Grammar, Standardization.

DESTPÊK

Destnîşankirina rêzikên rênivîsê¹ ji bo cihgirtina zimanê nivîskî û standardkirina zimanî yek ji karên giring ên plandanîna zimanî ye. Di kurdiya kurmancî da ev pêvajoyên hîn jî didome û gelek warên xam hene ku bi başî nehatine gengeşekirin. Bêguman rêziman yek ji dîyarkerên rênivîsa her zimanekî ye û bê zanîna rêzimanê yan jî destnîşankirina rêzikên wê mirov nikare rênivîseke tekûz destnîşan bike. Ji ber vê Celadet Bedirxan dîyar dike ku rêzikên rênivîsê ji tevahiya rêzimanê tîr derxistin û ji bo rênivîseke birêkûpêk nasîna rêzimanê pêwîst e (1941: 11). Herweha Mesûd Mihemed jî di navbera rêziman û rênivîsê da peywendîyeke organîk dibîne û destnîşankirina rêzikên rêzimanê ji bo dîyarkirina rêzikên rênivîsê wek mercekê derdixe pêş (1976: 252, 277). Ji Celadet Bedirxanî heta niha gelek xebatên rêzimanê û hin xebatên rênivîsê yên serbixwe hatibin kirin jî mixabin gelek mijarên çaresernekirî mane ku pêwîstiya wan bi vekolînên hûrtir heye.

Yek ji van mijaran pêkhatin û rênivîsa hokeran û destebêjeyên hokerî (adverbial phrase) ye. Ji ber ku di piraniya xebatên rêzimanê da giringîyeke pêwîst bi mijara hokeran nehatîye dayîn û hûrgilîyên wê nehatine berbiçavkirin, li ser pêkhatin û rênivîsa wan lêhûrbûn çê nebûye. Loma jî di xebatên rênivîsa kurmancîyê da ev mijar nayê behskirin (bnr: Zêrevan, 1997; Aydogan, 2012; Komxebata Kurmancîyê, 2019) û kesên mîna Arif Zêrevanî di destpêka xebata xwe da vê mijarê û hin mijarên din hewaleyî vekolerên paşerojê dikin (1997: 15). Ji ber nebûna xebateke biserûber di vî warî da û destnîşanekirina rêzikên vê mijarê, dema ku em berê xwe didin deqên nivîskî yên kurmancîyê em dibînin ku di warê rênivîsa hokeran da tevlihevîyeke mezin heye û her nivîskar di nivîsîna wan da yan xwe dispêre herêma xwe yan jî li gor bîr û raya xwe ya şexsî rêçikekê dide ber xwe ku gelek caran di nav xwe da jî nakok e. Sedemêke din a vekolîna vê mijarê ji aliyê me ew e ku hoker ji beşên din ên axiftinê cîyawaztir ji ber peywendîya wan a xurt di gel daçekan û guherteyên wan ên tewandî û netewandî gelek caran dibin sedema sergêjîyê û pêwîstî bi wê yekê heye ku ev mijar bê ronkirin.

Ji bo rêzimannasên kurmancîyê aşkera ye ku hoker ji beşên axiftinê yên sereke ne û ji aliyê dem, çawanî, çendîtî, cih, nîşandan, sedem û cextkirinê ve karîgerî li ser lêker, rengdêr û hokeran bi xwe çê dikin (bnr: Badîllî, 1965: 73; Bedir-Xan, 1971: 10) lê ji aliyê nivîsîna xwe ve bi giştî xwedî taybetmendiyên cîyaker û xweser ên morfolojîk nînin û peywendîyeke wan a bihêz bi beşên din ên axiftinê ra heye. Ji ber vê navdêr, rengdêr, cihnav, daçek û rader bi hêsanî dikarin wek hokeran bîr bikaranîn. Bi vî awayî jî bilî çend awarteyan em hokeran ne bi taybetmendiyên wan ên morfolojîk, lê li gor rola wan a di nav risteyê da ji bêjeyên din cîya dikin. Li aliyê din hoker di bingeha xwe da dikevin nav kategoriya bêjeyên neguherbar (bnr: Bedir-Xan, 1941: 11; Bedir-Xan, 1971) û ji navdêr û beşek cihnav û beşek rengdêran cudatir natewin. Lê yan ji ber hokarên arkaîk ên ku îro pê nizanin yan jî peywendîya wan a xurt bi daçekan ra di pêkhatina hin hoker û destebêjeyên hokerî da roleke berbiçav a gireyên tewangê çê dibe. Lewra bi derbazbûna demê ra dema ev hokarên arkaîk wînda dibin yan jî gava ku hin pêşdaçek dikevin, formên tewandî yên hin hokeran peyda dibin û ji rêzikên tewangê der, ev gire dibin taybetmendîyeke wan a morfolojîk. Herweha ji ber bikarneanîna daçekan û mayîna gireyên tewangê bi navdêran ve di mînaka hin hokeran da manaya ku ji daçekan peyda dibe diçe ser gireyên tewangê û ev gireyên ku di eslê xwe da tu roleke wan a guhertina manayê nînin herwek gireyên dariştinê roleke manadayînê jî digirin ser xwe. Ji bilî vê di mînaka hin hokerên çendîtîyê da li hin herêman carinan serederîya berkarê (object) jî bi van hokeran tê kirin û tevî ku hoker bêjeyên neguherbar in jî herwek navdêr û hin cihnav û rengdêran tîr tewandin û ev jî dibe sedema tevlihevîyan ku pêwîstiya wan bi çareserîyê heye. Bêguman hoker jî mîna beşên din ên axiftinê di her zar, şêwezar û devoka kurdîyê da xwedî guherteyên curbicur in û bi guherîna dengî awayên wan ên cîyawaz peyda dibin. Lê di zimanê nivîsînê da em neçar in ku di çarçoveya prensîbên resenî, dêrînî û berbelavîyê da yek ji van awayan hilbijêrin da ku di nav bikarhênerên zimanî da standardek çê bibe. Herweha pêvenivîsîn û cihê nivîsîna hokerên lêkdayî jî yek ji armancên xebatên rênivîsê ye ku heta niha di xebatên rênivîsa kurdîya kurmancî da nebûye mijara gotûbêjê û ev hoker bi çendînan awayan tîr nivîsîn.

Ji ber van sedeman em dê di vê xebatê da li ser rênivîsa hoker û destebêjeyên hokerî hûr bibin û bi palpiştîya klasîkên kurdîyê, berhemên hevçerx, raçavkirina rêzikên rêzimanê, reh û awayê pêkhatina wan û radeya berbelavîya wan modeleke guncaw pêşnîyaz bikin. Ji bo vê yekê em dê li ser rêça pirtûkên rêzimanê bincureyên hokeran yek bi yek destnîşan bikin û li ser pêkhatin û rênivîsa wan rawestin. Ji ber vê em dê vê mijarê di bin sernavên hokerên demê, hokerên çendîtîyê, hokerên çawanîyê, hokerên nîşandanê, hokerên cihî, hokerên sedemê, hokerên nerênî, hokerên

1 “Rênivîs” di kurdîya soranî da bi awayê “rênûs”ê û di kurdîya behdîni da jî wek “rênivîs”ê tê bikaranîn û ne dahênana me ye. Em ji ber sê sedeman bikaranîna vê ji “rastnivîsîn”ê baştir dibînin. Xala herî giring ew e ku gelek mijarên ku em di bin sernavê rênivîsê da behs dikin peywendîya wan bi “rastî” û “çewtî”yê nîne û ji nav modelên cîyawaz em ji bo hêsanîkirina xwendin û têgihîştinê yekî tercîh dikin. Ji ber vê jî ne rast e ku em ji bo navê giştî yê karekî weha bêjeya “rastnivîsîn”ê bi kar bînin. Li aliyê din dema em “rênivîs”ê tercîh bikin dê di navbera navendên giring ên kurdîyê da hevgirtineke zaraveyî jî çê bibe ku ev jî xaleke giring e. Li aliyê din mentîqa dariştina “rêziman” û “rênivîs”ê yek e û madem em “rêziman”ê herwek soranîyê bi kar tînin divê em “rênivîs”ê jî ji ber heman mebestê bi kar bînin. Ji ber vê em pêşnîyaz dikin ku kurdên me yên bakurî di şûna “rastnivîsîn”ê da “rênivîs”ê bi kar bînin.

cextkirinê û hokerên pirsyarîyê da dabeş bikin û li gor awayên pêkhatinê, wan yek bi yek rave bikin. Ji bo vê xebatê ji bilî xebatên rêziman û rênivîsê ji bo nasîna pêkhatin û awayên dêrîn ên hokeran em dê berê xwe bidin berhemên kevin û nû yên kurdîya kurmancî jî. Ji ber vê em dê *Dîwana* Melayê Cizîrî, *Mem û Zîna* Xanî, helbestên Feqîyê Teyran, *Seyf-ul Milûk û Melke Xatûna* Sîyahpoş, *Dîwana* Perto Begê Hekarî, *Qewlê Newala Sîsebanê*, *Dîwana Weda'î*, *Xeberdana Zimanê Kurmancîya* Mela Mehmûdê Bazîdî wek çavkanîyên serdema pêşmodern û kovara *Hawarê*, *Kurê Zinarê Serbilinda* Sidqî Hirorî, *Mirina Kalekî Rind* û *Hawara Dîcleyê 2ya* Mehmed Uzunî, *Lehîya* Firat Cewerî, *Heftiyêke dirêj li Amedêya* Fawaz Husênî, *Aloleya* Perwîz Cîhanî wek çavkanîyên serdemî bi kar bînin ku her yek ji wan temsîla herêm û devokeke cîyawaz a kurmancîyê dike. Ji bilî van, bi taybetî ji bo hin hokerên çendîtyê yên gengeşbar ku bi paşgira yekhejmar a nenasyarîyê (-ek) hatine çêkirin me bi rêya Whatsappê bi çend kesan ra anketek çê kir û bi rêya çend vebijêrkan me xwest em bikaranînen devokên cîyawaz ên kurmancîyê binasin.

1. HOKERÊN DEMÊ

Hokerên demê mîna piraniya hokeran bi awayekî xwerû tînen bikaranîn lê ji ber hin hokerên arkaîk yan ketina daçekan hin ji van hokeran li gor zayend û mêjera xwe paşgîrên tewangê (-î, -ê, -an) werdigirin. Ji bilî vê, hin hokerên demê di gel daçek û rengdêran wek destebêjeyên hokerî jî tînen bikaranîn. Li gor awayên pêkhatina wan, mirov dikare hokerên demê di bin sêzdeh kategorîyên jêrîn da destnîşan bike:

1. Hokerên demê yên bingehîn bê wergirtina tu gireyê tewangê bi awayê xwerû tînen bikaranîn. Mînak: niha, duh, îro/evro, îşev, îsal, sibeh, par, pêrar, êdî... Bêguman di nav gelî da çendî guherteyên van hokeran hebin jî di zimanê nivîsînê da divê yek ji van guherteyan bê hilbijartin. Bo nimûne; **duh** (dihî, dihî, duhî, do, doh), **sibeh** (sebah, sebeh, sibe, sibeng, sibê, sive, siveng, siwe, subê), **niha** (ana, aniha, aniho, anuha, naha, neha, nihe, niho, nihok, nuha, nihu, nuho, niwa, nika, noke, nûke), **tavil** (tafil, tafilê, tafilkê, tavilê, tavilkê, tawil), **êdî** (eydî, êdin, êdina, êndî, hêdîna, idî, indir, indî, îda, îdin, îdî), **dîsa** (dîs, dîsan, dîsanê, dîsanî), hêj (hê, hêja, hêjan, hêjika)... (bnr: Komîsyon, 2012: 90, 92, 102, 133, 197, 255, 273) nîşaneyê wê curbicurîya guherteyan e û di nivîsarên kurdîyê da mirov rastî piraniya van guherteyan tê. Bi bawerîya me ji ber berbelavîya wan û prensîba netewandina van hokeran di nivîsînê da divê formên reşkirî bînen bikaranîn.

Ez **duh/ îro/ sibeh/ par/ pêrar/ dîsa** hatim.

Herçend îro di nivîsînê da neyê bikaranîn jî em di deqên kevin ên kurdîyê da rastî formeke taybetî ya hin ji van hokeran jî tînen ku piştî bêjeyên mîna “îro, îsal, îşev”ê paşgira “-e”yê tînen bikaranîn û ev bikaranîn hîn jî li herêma Behdînan û derûdora wê tê dîtin. Ev paşgîr kurtkirina morfema nîşandanê ya “ha/he”yê ku di *Dîwana* Melayê Cizîrî da wek gireyê tê dawîya van hokeran û di *Mem û Zîna* Xanî da jî bi her du awayan jî tînen bikaranîn. Ev bikaranîn ji bilî çavkanîyên navborî di piraniya deqên klasîk da tê dîtin. Hêjayê gotinê ye ev taybetmendî di kurdîya soranî da berfireh dibe, di forma “-(e)ke”yê da wek gireya nasyarîyê cihê xwe digire û ji bo nasyarkirina navdêran tînen bikaranîn.

Senaxwanê Feqeh im **îroke** di Cizîrê (Dîwan, 320).

Îrohe du kiç xerîqê şîba (Mem û Zîn, 89).

Da **îşeve** remlekê birêjim (Mem û Zîn, 93).

Îsale bostanê we kusan e? (Xeberdana Zimanê Kurmancî ye, 48).

2. Gireya “-an”ê tevî ku gireya tewangê ya pirhejmarîyê ye, di hin hokerên demê da herwek gireya dariştinê tînen bikaranîn û manayeke taybetî dide wan. Ev jî bi çend awa û pêkhatinên cîyawaz derdikeve pêşîya me:

a. Dema “-an”ê ser navên dan, roj û werzan manaya “berdewamî” û rengdêra “her”ê dide wan. Ji ber vê ji bo “her havîn, her duşem û her êvar...”ê “havînan, duşeman, êvaran...” tînen bikaranîn.

Ez **havînan/ duşeman/ êvaran** diçim mala bavê xwe.

Di hin berhemên kevin ên kurdîyê da berî van hokeran pêşdaçek hatine bikaranîn û ev jî wê hizirê bi mirovî ra çê dike ku berê berî van hokeran pêşdaçek hebûne û bi demê ra ev pêşdaçek ketine. Di *Dîwana* Melayê Cizîrî da em rastî bikaranîneke weha tînen. Lê ev ne normeke cihgirtî û neguher e. Ji ber vê mirov di heman berhemê da rastî mînakên bê daçek jî tê.

Min go **di şevan** şubhê nucûman bi tewaf in (Dîwan, 214).

Kes dî **zemanan** hub bê melamet (Dîwan, 57).

Me **şevan** cam di kef û yarê dî ber (Dîwan, 168).

b. **caran (car+an)**: Ev hoker îro di kurdîya soranî û hin devokên kurmancîyê da di manaya “berê”yê da tê bikaranîn. Ev hoker di *Dîwana Melayê Cizîrî* da jî bi heman manayê hatîye. Herwek mînakên jorîn di vê hokerê da jî gireya “-an”ê bi tevahî rola xwe ya tewangê ji dest daye.

Kişandin lê ne wek **caran** xedengên qewsê nûbaran (*Dîwan*, 256).

c. **Carinan (car+in+an)**: Di vê hokerê da gireyên “-in” û “-an”ê manaya “hin”ê didin bêjeya “car”ê û pêkve hokereke demê çê dikin. Herçend guherteyên wê yên mîna “carna” û “carina”yê hebin jî di nivîsînê da bikaranîna “carinan”ê kevintir e ku ji Melayê Cizîrî heta gelek nivîskarên hevçerx bi vî awayî hatîye bikaranîn.

Carinan bendeê dil sohitiyê mehcûr ve vinêr (*Dîwan*, 227).

Carinan, gava “teqreq ji qirka wî dihat” (*Heftiyêke dirêj li Amedê*, 36).

d. **paşan (paş+an)**: Ev hoker li hin deverên hevsînor ên kurmancî û soranîyê tê bikaranîn û hevmanaya hokera “paşê” ye. Sîyahpoş vê hokerê di gel pêşdaçeka “li”yê weha bi kar tîne:

Li **paşan** ketne serhev û mehr û ba mah (*Seyf-ul Milûk û Melke Xatûn*, 42).

Ji malika Sîyapoşî dîyar dibe ku berê berî “paşan”ê pêşdaçeka “li”yê jî hatîye bikaranîn lê îro bê “li”yê jî tê bikaranîn.

Ew çû **paşan** ez hatim.

3. Ji rêzika jorîn cîyawaztir paşgira “-an”ê tenê ji bo pirhejmarkirina hin hokerên mîna “şev, roj, hefte, meh, sal...”ê jî tê bikaranîn. Ji ber ku berî van bêjeyan pêşdaçeka “bi”yê tê bikaranîn “-an”, tenê erka tewanga pirhejmarîyê bi cih tîne û tu roleke wê ya dariştinî nîne.

Ez **bi şevan/ bi rojan/ bi hefteyan/ bi mehan/ bi salan** li benda te mam.

Bi rojan jî, ez li ber pencereya mezin rûdiniştim (*Heftiyêke dirêj li Amedê*, 78).

4. Piranîya hokerên demê bêjeyên mîna ne û dema tîna tewandin paşgira “-ê”yê werdigirin. Herwek me li jor amaje pê kir ev hoker yan ji ber hokareke arkaîk yan ketina pêşdaçekan yan jî bikarnenaîna bêjeyên “dan” û “roj”ê bi awayê tewandî tîna bikaranîn. Ji ber vê, paşgira “-ê”yê ji bo van hokeran dibe nîşaneyêke morfolojîk û ev hoker di vê manayê da bê “-ê”yê nayên bikaranîn.

Ez **sibehê/ nîvrojê/ êvarê/ çarşemê/ îne** hatim.

Herçî bêjeya “sibehê” ye êdî ne tenê wek formeke hokerî ye, ji aliyê ferhengî ve jî bi tevahî leksîkalîze bûye. Lewra êdî “sibeh” roja piştî îro ye lê “sibehê” navê danekî rojê ye. Ji ber vê “ez dê sibeh bêm” û “ez dê sibehê bêm” heman manayê nadin.

5. Hin caran li gor pêwîstîya manayê li hin hokerên demê gireya nenasyarîyê ya yekhejmar zêde dibe û di vê rewşê da hoker di gel gireya mîna ya tewangê tê bikaranîn. Di berhemên kevin ên kurdîyê da ev hoker hem di gel pêşdaçekan hem jî bê wan tîna bikaranîn. Ev jî herwek xala (2a)yê wek sedema tewandinê berê me dide hebûna pêşdaçekê ku îro êdî nayên bikaranîn lê gireya wan a tewangê maye.

Ger min hebitin hezar û yek ser / Wan cumle **di rojekê** bi defter (*Mem û Zîn*, 115).

Ger **lehzeyekê** nekey tu goftar / Ger **sa’etekê** nebî tu xemxwar (*Mem û Zîn*, 109).

Hinek bêjeyên ku di eslê xwe da manaya demê nadin dema gireya nenasyarîyê tê ser wan herwek bêjeyên jorîn dibin hokerên demê.

Ez **çendekê** li wir mam.

Em **bêhnekê** li wir rûniştin.

6. Hokerên mîna “gelek, pir, hin, çend”ê dema tîna pêşîya bêjeya “car”ê gireya tewangê ya pirhejmar tê dawîya wan.

Gelek caran di tariyê de rêwing rêyên xwe winda dikin (*Bedir-Xan*, 1932, 1).

Mîr **pir caran** ba xwe ban Şingariyê dikir² (*Bedir Xan*, 1933, 1).

Min **çend caran** ji te ra got.

2 Di hejmarên pêşî yên *Hawarê* da di şûna “k”ya îro “q” dihat bikaranîn. Ji bo xwendevanên îro tevlihev nekin min li gor îro nivîsî.

Ew **hin caran** guh dide min.

7. Hinek hokerên demê bi arîkarîya paşgira “-kî”yê tèn dariştin ku manaya “dan” û “dem”ê dide bêjeyan. “Êvarkî” û “nîvrokî” bêjeyên weha ne ku em di çavkanîyên kurdîyê da rastî wan tèn (bnr: Alî Bedir Han-Lescot, 2004: 259).

Ez **êvarkî/ nîvrokî** hatim.

Heman hoker carinan bi rêya daçekên navdêrî yê mîna “ber” û “ser”ê jî tèn çêkirin ku ev daçek wek pêşgir tèn pêşîya bêjeyên demê û di heman manaya jorîn da tèn bikaranîn.

Berêvarkî were cem min.

Ezê **serêvarkî** ji kar vegerim (bnr: Tan, 2005: 171).

8. Dema rengdêrên nîşandanê (ev, ew) tèn pêşîya bêjeyên demê û di forma raveka rengdêrî da wek hokeran tèn bikaranîn hem rengdêrên nîşandanê hem jî navdêrên piştî wan di forma tewandî da tèn bikaranîn. Herwek “vê salê, wê mehê, wan rojan, ...” Dîyar e, di mînaka van hokeran da piştî ketina pêşdaçek yan bazinedaçekan formên tewandî peyda dibin. Delîla herî bihêz a vê yekê ev e ku ev hoker bi tu awayî di forma xwerû da nayên bikaranîn. Melayê Cizîrî di malikeke xwe da mînakeke vê kategorîyê di gel pêşdaçekê û Xanî jî bê pêşdaçekê bi kar tîne:

Horî ku tîk cema bin perî hem **di wê gavê** (Dîwan, 316).

Tacdîn mirina xwe **wê demê** xwest (Mem û Zîn, 209).

Di kurdîya hevçerx da êdî bi van hokeran ra pêşdaçek yan bazinedaçek nayên bikaranîn û awayên tewandî bûne taybetmendîyeke morfolojîk a van hokeran.

Ez **vê hefteyê/ wê mehê/ van rojan/ wan salan...** çûm mala wan.

Min **vê hefteyê/ wê mehê/ van rojan/ wan salan...** pirsra wî kir.

Di vê kategorîyê da her du bêjeyên hokera “vê gavê” li hin deveran di nav hev da dikelijin wek “vêga”yê dibin yek bêje. Di vê rewşê da her du bêje bi hev ve tèn nivîsîn.

Vêga nema dilê wî dibijiya wê (Heftiyêke dirêj li Amedê, 35).

9. Ji bo manaya “dan”ê (beşeke rojê) bide carinan pêşdaçeka “bi”yê tèn pêşîya hin hokerên demê. Di mînakên weha da pêşdaçek hokera piştî xwe natewîne. Herçend ev destebêjeyên hokerî jî hev cihê bèn nivîsîn jî ji ber hevgirtin û kelijîna wan a manayî êdî her du bêje yekeye manayî pêk tînin û netewîna navdêra piştî daçekê delîla herî bihêz a leksîkalîzebûna van hokeran e ku êdî serederîya hokerên asayî yê kategorîya yekem bi wan tèn kirin.

Weha **bi şev** û li ber tava heyvê, her pênc; sê xurt û dapîra Zuleyxa û Besna, ketine rê (Kurê Zinarê Serbilind, 15).

Ez **bi roj/ bi wext** hatim.

10. Hin hokerên demê dema paşgira nenasyarîyê ya yekhejmar werdigirin û manaya nenasyarîyê didine hokerê, li gor zayenda bêjeyê yan gireya tewanga mê (-ê) yan jî gireya tewanga nêr (-î) werdigirin. Di van mînakan da êdî paşgirên “-ek+ê = ekê” û “ek+î = ekî”yê dibin taybetmendîyeke morfolojîk a van hokeran.

Ez û yar ger **şevêkê** her du hemaxûş bibin (Dîwan, 149).

Rojekê goşt dereng ji me re hat (Heftiyêke dirêj li Amedê, 59).

Wextekî kesine weku min êşandine (Kurê Zinarê Serbilind, 65).³

Min **zemanekî** behsa wê kiribû.

Ev taybetmendî li hemû deverên kurmançîyê cihgir nîne û di hin deqan da piştî van bêjeyên demê carinan paşgira tewangê nayê bikaranîn. Mehmet Uzun di du risteyên li dû hev da li cihekî hokera demê bi awayê xwerû li cihekî jî bi awayê tewandî bi kar tîne:

Lê **rojek** tişteki wisan qewimî ku êdî ne bêhêvîti û ne jî xem û keser man. **Rojekê**, serê sibê di nav girsa postê de namekê jî xuya kir (Mirina Kalekî Rind, 82).

Şevêkê, piştî ku me bedenên xwe avêtin nav pêtên êgir (Mirina Kalekî Rind, 74).

Şevêk, di saetêke dereng de,... (Mirina Kalekî Rind, 105).

³ Li hin herêman wext wek navdêreke mê tèn bikaranîn û forma wê ya hokerî jî wek “wextekê” çê dibe. Lê di zimanê nivîsînê da ev bêje bi piranî wek nêr tèn bikaranîn û divê forma wê ya hokerî jî “wextekî” be.

Ji ber rêgirtina vê tevlihevîyê bi dîtina me divê li her cihî wek piranîya bikarhênerên kurmancîyê ev hoker di forma tewandî da bèn bikaranîn û rê li ber vê cotstandardîyê bê girtin.

11. Dema hin bazinedaçek di gel hin daçekên navdêrî tèn bikaranîn û pêşdaçek dikeve divê paşdaçek bi daçeka navdêrî ve bê nivîsîn (bnr: Zîlan, 1990: 50). Di vê rewşê da daçeka navdêrî û paşdaçek dibin yek bêje loma jî bi hev ve nivîsîna wan ji alîyê hev girtina manayî ve baştir e.

Ez **bi dû ra/re** hatim = Ez **dûra/dûre** hatim.

Dûre, piştî çend rojekan polîs bi ser rastiye hîlbû (Kurê Zinarê Serbilind, 111).

Ez **bi paş ra** hatim = Ez **paşra** hatim.

Ez **paşra** dê tiştêkê ji hewe ra bibêjim (Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, 12).

Ez **bi pişt ra/re** hatim = Ez **piştra/piştre** hatim.

12. Dema hin navdêrên demê bi rengdêrên mîna “her”, “din” û hinekên mîna wan ra tèn bikaranîn di forma ran vekên rengdêrî da hokerên demê çê dikin.

Ez **roja din/ şeva din/ hefteya din/ sala din** hatim.

Ez **her roj/ her hefte/ her meh/ her werz/ her sal** têm.

Şeva çûyî pir kêr xew ketibû çavên Besnayê (Heftiyêke dirêj li Amedê, 123).

Ez **havîna par** çûm Duhokê **payîza bê** jî ez dê biçim Sineyê.

13. Hokerên demê yên lêkdayî bi çend awayên cîyawaz pêk tèn û hinek bi hev ve, hinek jî cuda tèn nivîsîn.

a. Bi rêya bikaranîna gihaneka “û”yê, dubarekirina heman bêjeyê. Ev hoker ji bo xurtkirina manayê tèn dubarekirin û ji hev cuda tèn nivîsîn.

Belê dê evîna wî di dilê min yê siyamendî de **her û her** şîn bimîne (Kurê Zinarê Serbilind, 145).

Ew **tim û tim** pîrsa te dike.

b. Bi rêya bikaranîna daçeka “bi”yê dubarekirina heman bêjeyê. Carinan di navbera bêjeyên dubare da daçeka “bi”yê nayê bikaranîn û di her du rewşan da jî bêjeyên dubare ji hev cuda tèn nivîsîn.

Lê ez tinê ser ta qedem yekser disojim **dem bi dem** (Dîwan, 239).

Dem dem we dida li deffê mermer (Mem û Zîn, 181).

Car car tu têtî bîra min.

c. Hokerên demê yên ku bi arîkarîya rengdêra “her”ê û bêjeyê demê tèn çêkirin mîna ku di xala 12ê da jî hat nîşandan ravekên rengdêrî çê dikin û cuda tèn nivîsîn. Lê ji nav van, hokera “hertim”ê ji mînakên mîna “her gav, her dem, her sal”ê cuda ye û divê bi hev ve bê nivîsîn, lewra “her”a vir ne rengdêr e, hoker e û bi serê xwe jî di manaya “tim”ê da tèn bikaranîn. Bi dîtina me, ji ber vê kelijîna manayî û cudakirina “her”a rengdêr û “her”a hoker, divê “hertim” bi hev ve bê nivîsîn. Em di mînakên jêrîn da dibînin ku ji berê ve “her” û “tim” bi serê xwe wek hokerên tèn bikaranîn û heman manayê didin:

Ey xaliqê zemîn e **tim** l’wan bikî tu nezer (Qewlê Newala Sîsebanê, 70).

Mîrim kerema te **her** tamam e (Dîwana Weda’î, 108).

Ji vî alîyî ve hokera “hertim”ê ji hokerên xala 12ê yên ku bi “her”ê çê dibin, cuda ye û “her” û “tim” wek du hokerên hevmana bi demê ra dibin yek û divê bi hev ve bèn nivîsîn. Lê em nikarin heman tiştî ji bo “her sal, her gav...”ê bibêjin ji ber ku manaya “her” û “sal, gav”ê ji hev cuda ye û ev bêje di çarçoveya peywendîya ravekên rengdêrî da hatine cem hev.

Tu **hertim** di bîra min da yî.

d. Bi rêya bikaranîna navbergira “a”yê dubarekirina heman bêjeyê. Ev hoker bi hev ve tèn nivîsîn.

Lê ji bo min her **demadem** qehr û azarî diket (Dîwana Weda’î, 48).

e. Hin hokerên lêkdayî bi rêya dubarekirina heman bêjeyê û lêzêdekirina paşgira “-an”ê tèn çêkirin. Qanatê Kurdo bi mînakên “car caran, roj rojan, sal salan, dem deman”ê van hokeran cuda dinivîse (2021: 248) lê di hin çavkanîyên din da ev hoker bi awayên “carcaran” û “car-caran”ê jî tèn nivîsîn (bnr: Uzun, 1987: 25, 68). Bi raya me, ev hoker

divê bi hev ve bèn nivîsîn, lewra êdî ev bêjeyên dubare ji aliyê manayê ve di nav hev da kelijîne û tu sedema cuda nivîsîna wan nemaye. Jixwe bikaranîna gireya “-an”ê li dawîya bêjeya duyem nîşaneyê wê yekê ye ku ev her du bêje bûne yek û “-an” manaya her du bêjeyan temam dike, ne ku tenê ji bo bêjeya dawî tê bikaranîn.

Carcaran hin mirovan nema ji ber heycana nava xwe debar dikir (Heftiyêke dirêj li Amedê, 31).

f. Hokerên demê yên mîna “dusibeh, sêsibeh, siberoj”ê ji ber ku bûne yek bêje û amaje bi yek manayê dikin bi hev ve tèn nivîsîn. Li hin herêman di şûna “dusibeh” û “sêsibeh”ê da “duzbe/sêzbe” (bnr: Hirorî, ٨٤ : ١٩٩٦), “dusibe/sêsibe” bèn bikaranîn jî di nivîsînê da divê awayên pêşî bèn tercîhkirin, lewra bêjeyên navborî ji “du+sibeh” û “sê+sibeh”ê pêk hatine û divê li ser reha xwe ya resen bèn nivîsîn.

2. HOKERÊN ÇENDÎTÎYÊ

Hokerên çendîtîyê hejmar (mêjer) û radeya lêkeran dîyar dikin û bi sê awayên cîyawaz tèn bikaranîn:

1. Hokerên çendîtîyê yên bingeîn bi awayekî xwerû tèn bikaranîn. Hokerên mîna “kêm, zêde, pir, zehf...”ê weha ne⁴. Ji nav van, “zehf” li deverên cîyawaz bi guherteyên mîna “zaf, zahf, zav, zef, zehv”ê bê gotin jî (bnr: Komîsyon, 2012: 303) di nivîsînê da “zehf”ê cihê xwe girtîye û divê her weha bê nivîsîn.

Ez **kêm/ zêde/ pir/ zehf** diaxivim.

Herçend di pirsîna hokerên çendîtîyê da bèn bikaranîn jî hokerên “hinde/hindî, ewhinde/ewende, ev qas, ew qas, çi qas, ev çend, ew çend, ev qeder, ew qeder”ê jî wek hokerên çendîtîyê yên bingeîn tèn bikaranîn. Aşkera ye ku “ev” û “ew” wek rengdêr û “çi” jî wek bêjeya pirsyarîyê tèn pêşîya bêjeyên navborî û bi hev ra dibin hoker. Ji nav van hokeran, hokerên “ev qas, ew qas, çi qas”ê ji ber nebûna manaya serbixwe ya “qas”ê di kurdîyê da, ji aliyê hin kesan ve bi hev ve tèn nivîsîn lê dema mirov mînakên “bi qasî...”yê li ber çavan digire ji bo hevgirtina norman cuda nivîsîna wan baştir e, lewra eger nebûna manaya “qas”ê bibe bingeîn divê li her cihî bi bêjeyên berî xwe ve bê nivîsîn û ev jî dibe sedema bînpêkirina gelek normên cihgirtî. Herçî bêjeya “ewhinde/ewende”yê ye, herçend “hinde” bi serê xwe bê bikaranîn jî herwek soranîyê ji ber meyla sivikbûn û ketina dengan û nemana cîyawazîya manayî di navbera “hinde” û “ewende”yê da bi hev ve nivîsîna wan baştir e.

Hûn **hinde** muqeyyed in di qeydê (Mem û Zîn, 87).

Hindî ku me kir texmîn û tedbîr nebûn çare (Dîwan Perto Begê Hekkarî, 162).

Çend pirsî ji tebîban mi dewayê dilê jar (Dîwan Perto Begê Hekkarî, 198).

Ev çende zemane ew xulam e (Mem û Zîn, 114).

Ew çende bi yek ve radimûsan (Mem û Zîn, 135)⁵.

Ew qeder cewr û cefa û sitemêt dîtine min (Dîwan Perto Begê Hekkarî, 238).

2. Hokerên çendîtîyê bi rêya paşgira pileya berawirdîyê “-tir”ê jî tèn çekirin û bi rêya vê paşgirê ji aliyê çendîtîyê ve berawirdîyekê çê dike.

Ez **kêmtir/ pirtir/ zêdetir/ bêhtir** dixwazim.

3. Dema (-ek)a paşgira nenasyarîyê ya yekhejmar tê ser hin rengdêr û navdêran di mînakên “gel+ek, hin+ek, piç+ek, qeder+ek, dilop+ek, qurt+ek parî+y+ek...”ê da hin hokerên taybetî çê dibin. Hêjayê gotinê ye, manaya yekê hejmarîyê di mînakên “gelek, hinek û piçekê”ê da nemabe jî bingeîn vê paşgirê her ev e. Em dikarin bibêjin ku ji aliyê bikaranînê ve hokerên herî aloz ev in ku çendîn awayên bikaranîna wan heye:

a. Di berhemên kevin da û di hin berhemên nivîskar û zimannasên hevçerx da ev hoker bi awayê xwerû û bê werw girtina gireyên tewangê tèn bikaranîn:

Mîr û Kirmanc li holan **qederek** westane (Dîwan, 142).

Me j’ dostê **satek** dûr nekî perkende û mehcûr nekî (Dîwan, 248).

Gelek sotim kirim rijî (Feqiyê Teyran, 159).

4 Herçend hindîk be jî di hin çavkanîyan da paşgira “î”yê li hokerên weha jî tê zêdekirin. Bo nimûne Îbrahîm Remezan Zaxoyî yê ku pirtûkeke rêzimanê nivîsîye “pir”ê di gel paşgira “-î”yê weha bi kar tîne: Ev xanî pirtî kevine (Zaxoyî, 1998: 62).

5 Di klasîkan da ji ber bikaranîna “ev” û “ew”ê herwek soranîyê ji bo xurtkirina manaya nîşandanê paşgira “-e”yê jî tê dawîya “çend”ê.

Dayîn û Sitî **hinek** di ber çûn (Mem û Zîn, 252).

Zerrek ji ‘eqil ti ser nemaye (Dîwan Perto Begê Hekkarî, 52).

Gelek zêde erzanî ye (Tûhfetu’l Xîlan fi Zimanê Kurdan, 118).

Ez bi dîtina we **gelek** bextewar im (Bedir-Xan, 1971: 60).

Ez **gelek** baştir im (Zaxoyî, 1998: 62).

Gelek baş e (Kurê Zinarê Serbilind, 33).

b. Li hember vê bikaranînê li hin herêman li gor zayenda wan, gireyên tewangê yên “î” û “ê”yê li hokerên navî borî zêde dibin. Ev bikaranîn jî herwek hin hokerên demê dibe ku ji ber hokareke arkaîk be yan jî ji ber bikaranîna pêşdaçeka “bi”yê be. Bo nimûne di rêzimana Celadet Bedirxan û Roger Lescotî da em rastî forma “bi gelekî”yê tîn (204: 262) ku piştgirî dide raya duyem. Di nivîsarên hevçerx da tevî ku ev pêşdaçek nayê bikaranîn jî nivîskarên van herêman dîsa van hokeran bi awayê tewandî bi kar tînin.

Ez **hinekî** di nava xwe de keniyam (Heftiyeke dirêj li Amedê, 40).

Tu tenê **kîloyekê** bixwazî? (Heftiyeke dirêj li Amedê, 35).

Ez ji te re nabêjim ka **qurtekê** jî bi ser gewriya xwe de bike (Heftiyeke dirêj li Amedê, 107).

Nivîskarên van herêman herçend van hokeran bi formên tewandî bi kar bînin jî carinan zayenda wan tevlihev dikin. Bo nimûne tevî ku bêjeya “tibab”ê nêr e jî Firat Cewerî di romana *Lehîyê* da hokera “tibabek”ê hem di forma nêr da hem jî di forma mê da bi kar tîne. Ev, ji bo hin hokerên din jî weha ye ku zayenda wan tê tevlihevkin.

Em **tibabekê** çûn (Lehî, 30).

Te **tibabekî** ez di hemêza xwe de teselî kirim (Lehî, 100).

Serdana Kurdistanê Iraqê ez **hinekê** tirsandim (Zêrevan, 1997: 39).

Hinekî bi wir de here (Tan, 2005: 172).

c. Bi rêya antetekê ku me li ser Whatsappê bi çend hevalan ra pêk anî, ji bo me derket ku li hinek herêman sere-derîya berkarê bi van hokeran tê kirin û li gor taybetmendiyên tewangê ev hoker hem bi awayê xwerû hem jî bi awayê tewandî tîn bikaranîn. Ji ber vê hokerên navborî di demên niha û dahatî da bi formên tewandî û di demên borî da jî bi formên xwerû tîn bikaranîn. Bi dîtina me ev awa bi tevahî li dijî rêzikên nivîsîna hokeran e û nabe ku taybetmendîya tewangbarîya navdêran li ser hokeran bê cihbicihkirin.

Min **hinek** xwar = Ez **hinekî** dixwim.

Min **parîyek** xwar = Ez **parîyekî** dixwim.

Min **piçek** xwar = Ez **piçekê** dixwim.⁶

d. Ji bilî van sê awayên hevgerî li hin herêman û hinek nivîskar bi awayekî bêrêzik hokerên vê kategorîyê bi kar tînin û carinan wan bi awayê xwerû carinan jî bi awayê tewandî bi kar tînin.

Heger her deqek **gelek** dirêj be... (Zêrevan, 1997: 40).

Ez **gelekê** lê xebitîm ko fêm bikim ka çima wî welê kiriye (Zêrevan, 1997: 62).

Gelek baş e ku teknîk û pêşveçûn niha hîn zêdetir di xizmeta merivan de ye (Mirina Kalekî Rind, 14).

Meriv diviya **gelekî** nêzîkî lê bikira... (Mirina Kalekî Rind, 36).

Wext dê **hinek** li me teng be (Mirina Kalekî Rind, 29).

Em **hinekî** din jî bi hev re rûniştin (Mirina Kalekî Rind, 64).

Ji nav van çar awayan bi dîtina me, ji bo nivîsînê rêçika herî baş ew e ku em li gor berhemên kevin ên kurdîyê biçin û van hokeran netewînin, lewra eger awayê tewandî bê hîlbijartin hem mijara zayenda bêjeyan hem jî rêzika tewangê dê hişê bikarhêneran tevlihev bike û bikaranîna van hokeran diwartir bike. Ji ber vê em pêşniyaz dikin ku ev hoker li her cihî wek “gelek, hinek, piçek, qederek...”ê bîn bikaranîn.

⁶ Hêjayê gotinê ye, ji ber ku li hin herêman, nêrtî û mêtîya bêjeyan diguhere li hin herêman bêjeya “parîyek”ê wek mê, li hin herêmên din jî “piçek” wek bêjeyê nêr tê tewandin. Ji ber vê mirov rastî formên “parîyekê” û “piçekî”yê jî tî.

3. HOKERÊN ÇAWANÎYÊ

Navdêr, rengdêr, cihnav û rader carinan bi serê xwe û gelek caran jî bi arîkarîya pêşdaçeka “bi”yê dema awayê pêkhatina lêkerê nîşan didin hokerên çawanîyê pêk tînin. Tevî bikaranîna pêşdaçekê piraniya hokerên çawanîyê gireyên tewangê nagirin. Lê ji bo çêkirina cîyawazîyên manayî hin caran piştî daçekan navdêr yan cihnav tên tewandin ku di erka hokeran da tên bikaranîn.

1. Rengdêrên çawanîyê dema çawanîya lêkeran diyar dikin dibin hoker û ji aliyê morfolojîk ve tu cîyawazîya wan nîne. Bi vî awayî bêjeyên “baş, xirab, qenc, rind, xweş, nexweş” li gor cihê bikaranînê hem dibin rengdêr û hem jî dibin hoker.

Ez **baş/ qenc/ rind/ xweş** dixebitim.

2. Hin hokerên çawanîyê wek destebêjeyên hokerî bi rêya pêşdaçekên “bi” û “bê”yê û navdêrê tên çêkirin. Di vî rewşê da daçek û navdêr cuda tên nivîsîn û navdêr nayên tewandin.

Tûr im û **bi dil** peyrewê Mûsa yim ez (Dîwan, 98).

Rabûn **bi edeb** etek kirin bûs (Mem û Zîn, 119).

Li kêleka hevûdu, **bi tirs**, li pê sekinîbûn (Hawara Dicleyê 2, 168).

Çaxa pirs **bê bersiv û deng, bê olan** dimîne (Hawara Dicleyê 2, 121).

Min, zebeş **bê kêr** jê kir (Baran, 2018: 118).

Hin ji van destebêjeyên hokerî li ser reha rengdêrê yan navdêrê din bi arîkarîya paşgirên “-î, -tî, -atî, -ahî, -anî”yê tên dariştin. Herwek “bi erzanî, bi kurtî, bi mezinahî, bi hevaltî, bi dostanî, bi mêranî, bi dijminatî, bi hostatî...”

Ez **bi başî/ bi pakî/ bi qencî/ bi rastî/ bi kêfxweşî** pê ra serederî dikim.

Herçend ne hokereke çawanîyê be jî navê zimanan jî di gel daçeka “bi”yê herwek temamkera hokerî (adverbial complement) tên bikaranîn û di vî rewşê da herwek bêjeyên jorîn nayên tewandin.

Ez vî tiştî **bi kurdî** dibêjim.

3. Hinek hokerên çawanîyê wek destebêjeyên hokerî bi rêya pêşdaçekên “bi” û “bê”yê û raderan tên çêkirin. Ev jî herwek hokerên jorîn cuda tên nivîsîn û rader nayên tewandin.

Qulingê perişkestî **bi vîyan û şîyan** giheşte armanca dilê xwe lê bi lingekî (Alole, 38).

Ez **bê xwarin** dernakevim derve.

Lê wek awarte hinek lêker ne di forma raderî da, di forma dema niha da di gel pêşdaçekan tên bikaranîn.

Wê **bi ken** berê xwe da min.

Ew **bê rawest** dixebite.

4. Berevajî rêzika jorîn eger piştî pêşdaçekên “bi” yan “bê”yê navdêr yan cihnavê bê û manaya navgînekê yan pevrabûn û pevranebûnê bide, wê demê bêjeya piştî daçekê ditewe.

Mela bêqameta yekta qiyamet min **bi çehvan** dî (Dîwan, 28).

Ez **bi otobusê** hatim.

Şîlan **bê min** naçe cihekî.

5. Eger piştî pêşdaçeka “bi”yê navdêr paşgira nenasyarîyê ya yekhejmar bigire (-ek) li gor zayenda xwe ditewe.

Ez dibêjim yên qanûnê jî **bi mebestekê** dixwendin (Kurê Zinarê Serbilind, 66).

Ez **bi şertekî** tîm.

6. Hin hokerên çawanîyê bi rêya pêşdaçeka “bi”yê, navdêrê û paşgira “-kî”yê tên çêkirin.

Ew **bi filekî/ bi gawirkî** li mirovan dixê.

Di hinek hokeran da pêşdaçeka “bi”yê dikeve û “-kî” bi tena serê xwe dibe taybetmendîyeke morfolojîk a van hokeran. Dirêjkî, devkî, qeşmerkî, paşpaşkî, serserkî, serqûnkî... mînakên vî ne.

Radibû, pêgermok lê dida û lev dizivirî dîsan **kundkî** rûdinişt (Alole, 13).

Ew (bi) **serserkî** hat xwarê.

Erebe (bi) **paşpaşkî** dihat.

7. Hin hokerên çawanîyê bi rêya navdêr yan rengdêrekê û paşgira “-ka”yê pêk tên û manaya awa û şeweyê kirdayê didin hokerê: zûka, hêdîka, dizîka...

Ew **dizîka** hat hundir.

Av **hêdîka** diherike.

Di hin çavkanîyan da û li hin herêman berî van hokeran pêşdaçeka “bi”yê jî tê bikaranîn.

Ava Dîcleyê **bi hêdîka** diherikî (Hawara Dîcleyê 2, 174).

Osmaniyan **bi dizîka**, bangî Yezdînşêr kiribûn (Hawara Dîcleyê 2, 216).

Xuya ye, bi demê ra pêşdaçek dikeve û awayên bê daçek cihê xwe digirin. Bi vî awayî birek destebêjeyên hokerî vediguherin hokerên asayî.

8. Hin hokerên çawanîyê bi rêya navdêrekê û paşgira “-ane”yê tên dariştin û manaya lêçûnê didin. Herwek “mê-rane, merdane, şêrane, jinane...”yê. Ev, ne taybet e bi hokeran û bi heman paşgirê rengdêrên çawanîyê jî tên çêkirin.

Ji hîcabê were der nazik û **mestane** bimeş tu (Dîwan, 179).

9. Daçekên şibandinê yên mîna “wek (weku, wekî, weke, weka), mîna (bînanî, mînanî), nola (notla) û fena (fenanî)”yê dema tên pêşîya navdêrekê, ev navdêr gireyên tewangê digirin û ji bo şibandina bi wî tiştî di forma destebêjeyên hokerî da hokerên çawanîyê çê dikin.

Wan ji bala lê dibarin **wek burûskan** remz û naz (Dîwan, 100).

Qehra **weku dujminan** diket def’

Zecra **weku zaliman** diket ref’ (Mem û Zîn, 248).

Mîna heyveronekê dibiriqîn (Hawara Dîcleyê 2, 115).

Ew **mîna mêran** êrîş dike.

Ew **wek berazekî** tevdigere.

Ew **fena pîrejinekê** diaxive.

10. Hokerên çawanîyê yên lêkdayî bi çend awayên cîyawaz pêk tên û çawa ku li jêr hatine rêzkirin hinek cuda û hinek jî bi hev ve tên nivîsîn.

a. Bi dubarekirina heman bêjeyan: hêdî hêdî, cuda cuda, nerm nerm... Ev bêje ji hev cuda bèn nivîsîn jî ji bo yekeye manayî tên bikaranîn.

Bi min ra **nerm nerm** diaxive.

b. Hinek hokerên dubarekirî bi rêya daçeka “bi”yê tên bikaranîn ku dikeve navbera heman bêjeyan û ji bo xurtkirina guvaşê tên bikaranîn: yek bi yek, rû bi rû, zû bi zû...

Daberistin **yek bi yek** çûn ber lîwayê rast û çep (Dîwan, 42).

Sist e te peyman gelek **taze bi taze** tivêt (Dîwan Perto Begê Hekkarî, 220).

Ev hoker bê “bi”ya navberê jî tên bikaranîn lê dîsa cuda tên nivîsîn. Mînak: yek yek, cot cot, kom kom...

Daxên me dîsa reş kirin **yek yek** ji nû ateş kirin (Dîwan, 247).

c. Li dawîya hinek hokerên lêkdayî yên dubare ku ji hev cuda tên nivîsîn paşgira “-o”yê tê zêdekirin. Mînak: yeko yeko, teko teko, hebo hebo...

Yeko yeko hatinê hetta jê kuştî hezar (Qewlê Newala Sîsebanê, 66).

Lê hemêşe dûrî hev û **teko teko** pêş da diçûn (Alole, 24).

Ez nokan **hebo hebo** dixwim.

d. Hinek hokerên lêkdayî bi rêya navbergirên “e”, “a” û “an”ê tînen çêkirin. Di vê rewşê da ev hoker divê pêkve bînin nivîsîn. Mînak: rasterast, hîrehîr, devadev, revarev, serapa, seranser... Ji van hokeran Melayê Cizîrî çend mînakên weha bi kar anîne:

Îro Mela **serapa** lew tîkî bûme atêş (Dîwan, 110).

Êjimarî ne **yekayek** me hemû şêşed û şeş (Dîwan, 112).

Wan di reqşê da ku dîm awur **peyapey** dane min (Dîwan, 152).

Bûyim polad li ber şîran **seraser** tîkî mam ber de (Dîwan, 173).

Du qîran lîk **beraber** ke (Dîwan, 197).

e. Hinek hokerên çawanîyê yênen lêkdayî ku ji aliyê manayê ve di nav hev da kelijîne bi hev ve tînen nivîsîn.

‘Aşiqê dilbendê qîştê can bidit **yekcar** rewa ye (Dîwan, 183).

‘Alemê **têkda** munewwer ke (Dîwan, 198).

Mîn **yekser** zanî ku Seddamî ew şandine (Kurê Zinarê Serbilind, 67).

Ez ji vê rewşê **zendegirtî** mabûm (Alole, 137).

4. HOKERÊN NÎŞANDANÊ

Hokerên nîşandanê bi rêya bêjeyên nîşandanê awayê pêkhatina lêkeran nîşan didin. Mirov dikare van hokeran di du kategorîyan da destnîşan bike:

1. Ev hoker bi du awayan derdikevin pêşîya me û ji bo nîşandana nêzik “vaye” û ji bo nîşandana dûr jî “waye” tê bikaranîn. Ev her du hoker ji “ev+ha+ye” û ji “ew+ha+ye”yê (cihnava nîşandanê+morfema nîşandanê+forma dema niha ya lêkera bûnê) pêk tînen. Tevî vê ev hoker carinan bê “ye”yê herwek “va” û “wa”yê jî tînen bikaranîn. Herçend di hin pirtûkên rêzimanê da ev hoker bi awayê “va ye” û “wa ye”yê bînin nivîsîn jî (bnr: Ciwan, 1992; Baran, 2018: 103) ji ber ku ev bêje û morfem êdî manayeke yekgirtî didin û bi ketina dangan di navbera wan da kelijandin çê bûye divê bi hev ve bînin nivîsîn.

Waye hisabdarê me xerîke mehaneya min û derengîyên min dihejmêre (Alole, 90).

2. Hokerên nîşandanê yênen kategorîya duyem bi piranî berî lêkeran tînen bikaranîn. Ev hoker xwedî çend awayên cîyawaz in ku hinek ji wan bêjeyên xwerû ne, hinek bi rêya hin bêje û morfeman û hinekên din jî bi rêya ravekên rengdêrî pêk hatine:

a. **We**: Ev hoker bingeha gelek hokerên din pêk tîne û di *Dîwana* Melayê Cizîrî da hem bi awayê “we”yê hem jî bi awayê “weh”ê hatîye bikaranîn.

Pîrê muxan ji rendan **weh weh** fikir rîwayet (Dîwan, 55).

Sermediyyet **we** dixwazit ne ezel bit ne ebed (Dîwan, 85).

Ev hoker, di hin devokên kurmancîyê da bi awayê “wa”yê bê gotin jî di nivîsînê da zêde nayê bikaranîn û herçî “weh” e êdî qet nayê bikaranîn. Li hember vê “we” hem di hemû klasîkan da hem jî îro li herêmên Botan, Hekarî û Behdînanê zindî ye û wek hoker tê bikaranîn.

Ma ne **we** ye? (Kurê Zinarê Serbilind, 16).

Li ser bingeha vê hokerê, bi lêzedekirina hin morfem û bêjeyên din hokerên nû jî tînen dariştin ku li jêr hatine rêz-kirin.

b. **Weha**: (**we** + **ha**): “Weha” di nivîsînê da awayê herî berbelav û cihgir e ku li herêmên cîyawaz bi guherteyên “ahwa, awha, ewha, ewa, ûha, waha, wehe, wiha”yê jî tê bikaranîn (bnr: Komîsyon, 2012: 289). Morfema “ha”yê ku hatîye ser hokera “we”yê xwedî reheke dêrîn e û di avestayî da jî manaya cihlava “ev”ê dide (bnr: Sivrioğlu, 2015: 151). Ev bêje di kurdiya îro da wek bêjeyeke serbixwe di manaya nîşandanê da bê bikaranîn jî bi piranî ji bo xurtkirina manaya nîşandanê tê dawîya bêjeyan⁷. Xanî di *Mem û Zînê* da ji ber ku di şûna “ha”yê da “he”yê bi kar tîne ji bilî “weha”yê vê hokerê wek “wehe”yê jî bi kar tîne:

⁷ “ha” bi guherteya “he”yê jî tê bikaranîn. Weda’î vê morfemê di gel bêjeyeke nîşankirî weha bi kar tîne: “Di hicrê mam bi vî **karê he** mişkil” (Dîwana Weda’î, 85).

Bo çî digirî **weha** bi nakam? (Mem û Zîn, 103).

‘Arif **wehe** gote Rustemê Zal (Mem û Zîn, 221).

c. **Wesa (we + sa)**: Ev awa li herêma Behdînan û Hekarîyê tê bikaranîn lê li herêmên din guherteyên wê yên mîna “wisa, usa, ûsa, isan, wesan, wisan, wisanê wusa, wusan, wiso usan”ê hene. Herwek “ha”yê “sa”ya vê hokerê jî morfemeke fosilîzebûyî ye ku reha wê diçe heta zimanên kevin ên malbata zimanên hînd û ewropayî. Ev morfem, di sanskrîtîyê da bêjeyeke serbixwe ye û manaya “ew”ê dide (bnr: Sivrioğlu, 2015: 276). Herçend di navbera “weha” û “wesa”yê da îro cîyawazîya manayî nebe jî li ser vê reha kevin a van her du morfemên dawî em dikarin bibêjin “weha” ji bo nîşandana tiştên nêzîk û “wesa” ji bo nîşandana tiştên dûr guncawtir e. Ev her du hoker, her du hokerên tirkî yên “böyle” û “öyle”yê bi bîr tînin ku nêzî bikaranîna “weha” û “wesa”ya kurdîyê ne. Ji aliyê awayê nivîsînê ve jî ji bo parastina reha resen a beşa yekem a vê bêjeyê, divê awayê “wesa”yê di nivîsînê da bibe forma standard. Jixwe di klasîkên kurdîyê da ev hoker bi vî awayî hatîye bikaranîn:

Emma ji ezel Xwedê **wesa** kir (Mem û Zîn, 38).

Ji lutfa wî **wesa** bû rutbe e’la (Dîwan Perto Begê Hekarî, 36).

d. **Wereng (we + reng)**: Bi dîtina me “wer, were, werê, wir, werga, werge, werg, werganî, wergî, wirg, wirga, wirge, wirnî” guherteyên “wereng”ê ne ku bi ketina deng guherteyên bi vî awayî peyda bûne. Ev hoker herçend li herêmên cîyawaz bi awayên cîyawaz bê bikaranîn jî di klasîkan da bi awayê “wereng”ê hatîye bikaranîn û divê ev bibe forma standard. Melayê Cizîrî û Sîyahpoş vê hokerê weha bi kar tînin:

Zulmê **wereng** kê dikir can dibir û dil teba (Dîwan, 19).

Wereng min hêvîye ku ew mihebbet (Seyf-ul Milûk û Melke Xatûn, 26).

Di Qewlê Newala Sîsebanê da “wereng” di gel guherteya “werge”yê tê bikaranîn:

Wereng hevdu dihêrin, eyar li hev dirandin (Qewlê Newala Sîsebanê, 53).

Cewan gihandî Elî, **werge** tu rabe zû be (Qewlê Newala Sîsebanê, 60).

e. **Welê (we + lê)**: Li hin herêmên cîranên ereban di şûna “reng”a kurdîyê da “lewn”a erebîyê tê bikaranîn ku hevmanaya “reng”ê ye. Bi demê ra “lewn”a erebîyê di kurdîyê da sivik dibe û di gel “we”yê guherteyên “welê, welo, wilo”yê peyda dibin. Ji bo vê hokerê bêjeya herî guncaw “welê” ye ku tê da “we” hatîye parastin. Jixwe ji aliyê dîroka nivîsînê ve ev guherte dêrîntir e.

Welê min kir tesewwur gel xezûkî (Seyf-ul Milûk û Melke Xatûn, 21).

Welê westa ji perwazê qedama (Dîwan Perto Begê Hekarî, 37).

f. **Ho**: Hevmanaya “we”yê û li herêmeke berteng bi heman mana û erka “we”yê tê bikaranîn. Herçend di *Ferheng-a Kurdî (Kurmancî) – Tirkîyê* ya Rûpelê da ev hoker wek guherteya “we”yê hatibe dîtin jî (bnr: 2012: 291-292) ev hokereke cîyawaz û serbixwe ye.

Lew **ho** daîm ez dinalim keftime halek xerab (Dîwan Perto Begê Hekkarî, 57).

Dapîra guhgiran **ho** gote Besnayê (Kurê Zinarê Serbilind, 26).

g. **Holê (ho+lê)**: Ev hoker hevmanaya “welê” ye ku ji hokerên “ho” û sivikbûna bêjeya “lewn”ê pêk hatîye.

Divêt **holê** bête zanîn û xwendin (Nivîsanoq, 1933: 2).

h. **Hosa (ho+sa)**: Ev jî hevmanaya “wesa”yê ku ji hokera “ho”yê û morfema “sa”yê pêk hatîye:

Keça min **hosa** nabe (Kurê Zinarê Serbilind, 32).

i. **Ha**: Herwek li jor hat behskirin “ha” di avestayî da manaya “ev”ê dide û di kurdîya îro da tenê ji bo nîşandana tê bikaranîn. Ev bêje beramberî “îşte”ya tirkîyê ye û di şûna hokera “va/vaye”yê da tê bikaranîn. Çawa ku di gel hin hokerên din tê bikaranîn, bi serê xwe jî di erka hokerê da tê bikaranîn.

Belê kwîxwe, em pêşmerge ne û **ha** tu bi çavên serê xwe dibînî û em bisteh dikin bêne vêderê... (Kurê Zinarê Serbilind, 82).

j. **Halo (ha+lo)**: Ev hoker li herêma Torê tê bikaranîn û ji hokera “ha”yê û bêjeya “lewn”ê hatîye dariştin. Dîyar e, bi rêya sivikbûnê herwek “wilo”yê “lewn” bûye “lo” û bi hokera “ha”yê ve kelijîye.

Ji milê din jî pirsên nû dizê û **halo** zmanê me vedigere ser xurtiya xwe a pêşîn (Bedir-xan, 1932: 2)

k. **Ev reng:** Ev di forma raveka rengdêrî da wek hokereke nîşandanê tê bikaranîn û her du bêje ji ber ku di forma ravekê da hatine bikaranîn cuda tèn nivîsîn.

Ev reng e halê dilberan lew ‘aşiqan xûn bûn ceger (Dîwan, 94).

l. **Ew reng:** Herwek “ev reng”ê ev jî di forma raveka rengdêrî da wek hokereke nîşandanê tê bikaranîn û ji hev cuda tèn nivîsîn.

Ew renga reva kela girînê (Mem û Zîn, 238).

5. HOKERÊN CIHÎ

Hemû hokerên cihî di forma destebêjeyên hokerî da derdikevin pêşîya me ku bi rêya pêşdaçek, daçekên navdêrî, bazinedaçek û navdêran tèn pêkanîn û di nav hevokê da cihê tiştekî diyar dikin. Ev destebêjeyên hokerî li gor taybetmendiyên manayî bi çendîn awayan tèn pêkanîn ku li jêr hatine nîşandan:

1. **li + navdêr + gireyên tewangê:** li malê, li xwarê, li bajarî, li gundî, li deştan, li newalan...

2. **li + cihnavên nîşandanê:** li vir, li wir, li hir, ... Di mînakê “li vir” û “li wir”ê da hinek herêm “-a”ya morfema nîşandanê tînin dawîya wan û wek “li vira” û “li wira”yê jî bi kar tînin. Herweha hin herêm jî “-e”ya morfema nîşandanê tînin dawîya “hir”ê û wê wek “li hire”yê jî bi kar tînin. Li derûdora Tetwanê ev bêje dibe “liha” û li herêmên Hekarî û Behdînanê li şûna “li hir”ê “lêre” tê bikaranîn ku ji kelijîna pêşdaçeka “li”yê, bêjeya “hir”ê û “-e”ya paşgira nîşandanê pêk hatîye. Li+hir+e = lêre. Feqîyê Teyran û Xanî vê hokerê weha bi kar tînin:

Jin dibê tu were êre/ Em agirek bikin **lêre** (Feqîyê Teyran, 366).

Ez **lêre** emîn û destbidar im (Mem û Zîn, 278).

Lê di hin çavkanîyên kevin da ev hoker wek “li hire”yê jî hatîye bikaranîn:

Em çûne Sîsebanê, em **li hire** mayîne (Qewlê Newala Sîsebanê, 61).

3. **li + daçekên navdêrî + navdêr/ravek:** li jor, li jêr, li bin, li ser, li pêş, li paş li rex, li hember, li pêşber, li der, li hundir... Li hin deveran beşek ji van daçekên navdêrî herwek navdêran tèn dîtîn û tewandin. Herwek “li jorê, li jêrê”yê. Bi raya me, pêwîstî bi tewandina van bêjeyan nîne, lewra daçekên navdêrî nayên tewandin û ji navdêrên asayî cuda ne. Diyar e, li van deveran pêvajoya daçekbûna van navdêran temam nebûye loma jî tèn tewandin lê di kurdiya nivîskî da divê ev bêje wek daçekên navdêrî bên pejirandin û neyên tewandin.

Wê **li ser bejna te** ev seywan veda (Dîwan, 125).

Ku da Erjeng ji wê navê **li ber rojê** nebit perde (Dîwan, 174).

4. **li + ravebera tewandî + ravekera tewandî (bêjeya cihî):** li vê derê, li wê derê, li vî cihî, li wî cihî, li vî alîyî, li wî alîyî... Herwek tê dîtîn ji ber pêşdaçeka “li”yê hem raveber hem jî raveker di forma tewandî da tèn bikaranîn û nabe ev bêje di forma xwerû da bên bikaranîn. Di zimanê axiftinê da gelek caran daçeka “li”yê û hin dengên bêjeya duyem dikevin. Di vê rewşê da formên mîna “vê rê, wê rê, vê dê, wê dê”yê peyda dibin (bnr: Kaval, 1989: 30). Bi raya me divê di nivîsînê da ev awayên deforme neyên bikaranîn û eger ji ber hin mebestên edebî bên bikaranîn jî herwek “vêga”yê divê ew jî bi hev ve bên nivîsîn.

5. **bi + cihnava tewandî (wê) + da:** bi wê da. Dema daçeka “bi”yê neyê bikaranîn divê “wê” û “da” bi hev bên nivîsîn.

6. **di + navdêr + gireya tewangê + da:** di polê da, di zanîngehê da, di pirtûkê da...

7. **bi + daçeka navdêrî (ser) + navdêra tewandî yan cihnava tewandî + da:** bi ser da, bi ser wî da, bi ser malê da...

Bi ser çehvên Nîşanî da xiramê ew hilalebrû (Dîwan, 203).

8. **di + daçeka navdêrî + navdêra tewandî yan cihnava tewandî + ra:** di ser ra, di nav ra, di bin ra, di ser pirê ra, di nav tunelê ra, di bin malê ra...

9. **(ber) bi + navdêra tewandî/cihnava tewandî + (ve):** ber bi malê ve, ber bi min ve, bi wê ve...

10. **(ber bi) + cihnavên nîşandanê + da:** ber bi vir da, ber bi wir da, ber bi vê da, ber bi wê da. Lê di zimanê axiftinê da daçeka “ber bi”yê gelek caran dikeve û ev hoker wek “vir da” û “wê da”yê tèn bilêvkerin. Di rewşên weha da

ji ber ketina pêşdaçekan bi dîtina me divê herwek hokerên demê paşdaçek û cihnavanîşandanê bi hev ve bîn nivîsîn. Mînak: virda, wirda, vêda, wêda...

11. **ji + cihnavanîşandanê + ve/da:** ji der ve, ji hundir ve, ji vir ve, ji wir ve, ji vir da, ji wir da...

12. **ji + rengdêr + ve:** ji dûr ve, ji nêz ve,

13. **ji + daçeka navdêrî + ve:** ji bin ve, ji jor ve, ji jêr ve...

Ji bala tewrê insanî nezer da sa'idê sîme (Dîwan, 307).

6. HOKERÊN SEDEMÊ

Hokerên sedemê di forma destebêjeyên hokerî da ji pêşdaçeka "ji"yê, navdêr yan rengdêrekê û paşgira tewangê ya pirhejmar "an"ê çê dibe. Di zimanê axiftinê da "n"ya "-an"ê bikeve jî di nivîsînê da divê bê parastin.

Mînak ji kêf+an, ji hêrs+an, ji şerm+an, germ+an, ji birçî+n+an...

Li hin herêman piştî "-an"ê "a"yeke din jî tê bikaranîn û Qanatê Kurdo di rêzimana xwe da vê formê pesend dike: ji şermana, ji hêrsana, ji germana (2021: 243).

Bi raya me pêwîstî bi vê "a"yê nîne û ev hoker divê di forma jorîn da bîn bikaranîn.

Ew û serbazê din ye ku **ji tirsan** dilerizî dane pêş xwe... (Kurê Zinarê Serbilind, 89).

7. HOKERÊN NERÊNÎ

Hokerên nerênî ji wan bêjeyan pêk tên ku manayeke nerênî didin hevokê. "Na, naxêr, qet, hîç, nema, hew, tew..." hokerên nerênî ne.

Kiç **qet** li kiçan dibin xerîdar? (Mem û Zîn, 91).

Ez **hîç** ne zîrek bûm (Heftiyeke dirêj li Amedê, 60).

Ji mêj ve **nema** dizanim qerf û pêkenok çî ne (Heftiyeke dirêj li Amedê, 23).

Kêfa min **hew** ji wan cixaran re tê (Mirina Kalekî Rind, 57).

Ji nav van hokeran hinek jê xwedî çend guherteyên cîyawaz in û di nivîsînê da divê guherteyek bê hîlbijartin.

• **Na:** Li hin herêman bi awayên xwe yê "ne" û "no"yê bê bikaranîn jî di nivîsînê da "na"yê cihê xwe girtîye.

• **Naxêr:** Ji bêjeyên "na" û "xêr"ê pêk hatîye û wek gotineke nezaketê ji bo sivikkirina nerênîtiya "na"yê bi gotina "xêr"ê hatîye xweşkirin. Ji ber vê çawa "na" bûye forma nivîsînê divê "naxêr" jî herwek wê bibe forma nivîsînê û ji ber hev girtina manayî divê bi hev ve bîn nivîsîn.

• **Qet:** Hin caran bi awayê "qe"yê jî tê bikaranîn. Herçend "t" ji bo sivikkirinê hin caran neyê gotin jî divê di nivîsînê da bê parastin.

• **Hîç:** Li hin deveran wek "hêç"ê jî tê bilêv kirin lê di hemû zimanên îranî da ev hoker bi awayê "hîç"ê tê bikaranîn û di kurdîyê da jî bi vî awayî cihê xwe girtîye.

Hokera "tu"yê ku bi guherteyên xwe yê "ti, çu, çî"yê, xwedî manayeke nerênî ye, bi serê xwe nabe hokera demê û hertim bi bêjeya "car"ê ra tê bikaranîn. Ev hoker di nivîsarên kurmancîyê da bi sê awayan derdikeve pêşîya me: (a) bi awayê xwerû: tu car, (b) bi paşgira tewangê ya "-an"ê ra: tu caran û bi paşgira tewangê ya "-î"yê: tu carî. Ji bilî vê cîyawazîyê hinek kes van her du bêjeyan bi hev ve û hinekên din jî cuda dinivîsin.

Ji lewre ko bê intizam tu tişt nagehe, nameşe, **tucar** nikare heta paşîyê bimîne (Bedir-xan, 1932: 1).

Ew jî qe venaşirit **çu caran** (Mem û Zîn, 199).

Ez **tu carî** nayêm.

Ji ber ku "tu" (ti, çu, çî) hevmanaya hokerên "hîç" û "qet"ê ye û ne daçek e, bi raya me pêwîst nake mirov gireyeke tewangê bîne ser û di navbera gireyên "-î" û "-an"ê da bikeve sergêjanîyê. Çawa em "tu wext"ê bi awayekî xwerû bi kar tînin em dikarin "tu car"ê jî weha bi kar bînin. Bi raya me ev formên tewandî bi rêya analojîya hokerên demê yê mîna "gelek caran, hin caran, pir caran, çend caran"ê derketîye holê. Di vir da ji ber manaya pirhejmarîyê ya

hokerên “gelek, pir, hin, çend”ê “car” dibe pirhejmar lê di “tu”yê da manaya pirhejmarîyê nîne. Li alîyê din ev bêje eger bitewe jî ji ber mêbûna bêjeya “car”ê ne bi “-î”yê, divê bi “-ê”yê bitewe. Ji ber vê bikaranîna awayê “tu carî”yê jî ne beraqil e.

8. HOKERÊN CEXTKIRINÊ

Ev hoker cext û teyîda kar û kirdaran dîyar dikin. “Helbet, bêguman, bêşik...” mînakên vê kategorîyê ne. Hin ji van hokeran bi çend awayên cîyawaz tînin nivîsîn. Ji nav van “helbet” bi guherteya “elbet”ê bê bikaranîna jî (bnr: Perto Begê Hekkarî, 219) piraniya kurdan vê wek “helbet”ê bi kar tînin û divê di nivîsînê da ev awa bê tercîhkirin. Herweha hokerên cextkirinê yê mîna “bêguman” û “bêşik”ê jî carinan wek “bê guman” û “bê şik”ê bînin nivîsîn jî di piraniya deqên nivîskî yê kurdîyê da bi awayekî rast, bi hev ve tînin nivîsîn, lewra ev êdî bûne yek bêje û pêwîst nake ji hev cuda bînin nivîsîn.

Helbet rastiya xwe ji ber ku kê ji devîçûkê re bigota... (Heftiyêke dirêj li Amedê, 109).

Ez li vî bajarî ji te **bêguman** kêmtir biyanî me (Heftiyêke dirêj li Amedê, 70).

9. HOKERÊN PIRSYARÎYÊ

1. Pirsîna hokerên demê di avestayî da bi rêya hokerên “kada” û “kuda”yê tê kirin (Sivrioğlu, 2015: 95) û bi hin guherîn û lêzêdekirinan di hemû zimanên îranî da formên nêzîkê tînin bikaranîna. Bi dîtina me, ev hokera dêrîn bi zêdekirina bêjeya “gav”ê ku hevmanaya “dem” û “wext”ê ye, bi demê ra di gelê ve bêjeya dêrîn dikelîje û bi ketin û guherîna hin dangan li deverên cîyawaz di formên “kengê/ kînga/ kengî/ kengo/ kingê/ kînganê/ kîngê/ kîngî”yê da tê bikaranîna. Ji ber ku di klasîkên kurmancîyê da zêdetir guherteya “kengê”yê hatîye bikaranîna⁸ ji bo nivîsînê ev awa bê hîlbijartinê dê baştir be.

Ji îşqa kê her tîyê û tîyê/ Heta **kengê** her bêyê û bêyê (Feqiyê Teyran, 122).

Kengê te kaxez ji min ra nivîsî? (Kurdo, 1981: 128).

Min li wê dinîhêrî û jê dipirsî ka min dê – **kengê** – xwe rabigihanda Rindiyan (Mirina Kalekî Rind, 82).

Ji bilî ve forma sereke hokerên demê bi rêya cihnavaya pirsyarîyê ya “çî”yê û navdêrên “çax, wext...”ê jî tînin pirsîn.

Koma we **çî çax** teşkîl bûye? (Kurdo, 1981: 128).

2. Hokerên çendîyê bi rêya çend bêjeyên pirsyarîyê tînin pirsîn ku em ji wan ra hokerên pirsyarîyê dibêjin. “Çend, çî qas⁹, ev qas, ew qas, ev çend, ew çend”ê ji bo pirsîna hokerên çendîyê wek bêjeyên sereke tînin bikaranîna û divê bi awayekî xwerû bînin bikaranîna.

Tu **çend/ çî qas/ ev qas/ ew qas/ ev çend/ ew çend** dixwazî?

Herçend hinek herêm guherteyên “çî qasî, ev qasî, ew qasî”yê bi kar bînin jî divê mirov van hokeran bê pêşdaçeka “bi”yê di nivîsînê da bi kar neîne. Lê dema mirov bihayê tiştêkî bipirse pêşdaçeka “bi”yê tê pêşîya “çî qas, ev qas û ew qas”ê û di vê rewşê da tewanga “-î”yê li wan zêde dibe.

Tu **bi çendî/ bi çî qasî/ bi ev qasî/ bi ew qasî** dikirî?

Ji bilî van bêjeyên sereke, ji bo pirsîna hokerên çendîyê pêşdaçeka “bi”yê û cihnavaya “çî”yê jî bi hev ra tînin bikaranîna. Dîyar e, ev awa ji serdema pevguhertina tiştan ve maye ku di şûna pereyî da tişt bi tiştan dihatin guhertin.

Ev genim **bi çî** ye?

3. Ji bo pirsîna hokerên çawanîyê bêjeya “çawa/çawan”ê tînin bikaranîna ku li deverên cîyawaz wek “ça, çakî, çan, çankî, çewa, çewan, çewo, çing, ço, çoho, çolê, çowo”yê jî tînin bilêvkirin. Ji nav van guherteyan di nivîsînê da bi awayekî berbelav “çawa/çawan” tînin bikaranîna. Li ser reha van her du awayan du nêrîn derdikevin pêş ku li gor raya yekem ev bêje ji “çî+awa”yê pêk hatîye (bnr: Ciwan, 1992: 160) û bi ketina dengê “î”yê “çawa” peyda bûye. Li hember vê, Cemal Nebez di wê bawerîyê da ye bêjeya duyem a vê hokerê ji “wêne”yê hatîye (2008: 107) û bi vî

8 Ji ber ku di alfabe ya erebî-kurdî ya berê da her du dengên “î” û “ê”yê bi heman tîpê tînin nîşandan tîpguhêzên *Dîwana Melayê Cizîrî* û *Mem û Zîna Xanî* ev bêje wek “kengî”yê xwendîye. Lê dema mirov bikaranîna herêmên van helbestvanan li ber çavan digire divê ev hevkar wek “kengê”yê bihata nivîsîn. Ji ber ku tîpguhêzê helbestên Feqiyê Teyran ji wê herêmê ye ev hoker wek “kengê”yê nivîsiye.

9 Li hinek herêm û çavkanîyan da ev wek “çî qand”ê jî tînin bikaranîna (bnr: Kurd, 1956: 107).

awayî (çi+wêne) bi demê ra di kurmancîyê da bûye “çawan” û di soranîyê da jî bûye “çon”. Dema mirov “çetor”a farisîyê û “çito” û “çilo”ya hin deverên kurdîyê li ber çavan digire, aşkera ye ku bêjeya serî “çi” ye lê referansên bêjeyên duyem cîyawaz in. Di vê rewşê da weha xuya ye ku di “çawa”yê da bêjeya duyem “awa” ye, di “çawan/çon”ê da “wêne” ye, di “çilo”yê da “lewne” e û di “çito”yê da “tewir” e ku bi guherîn yan ketina hin dengên formên weha peyda bûne. Ji ber vê yekê em pêşniyaz dikin ku ji ber hevbeşîya di gel soranîyê “çawan” bibe bêjeya sereke û “çawa” jî wek forma duyem bê pejirandin. Jixwe di klasîkên kurdîyê da em rastî her du awayan jî tên û li ser vê rêçê di deqên hevçerx da jî ev her du awa tên bikaranîn.

Fehmê razê ger dikî **çawa** dinalin çeng û saz (Dîwan, 101).

Mela canê te **çawan** pehlewan kir (Dîwan, 104).

Paşê **çawan** bûye? (Xeberdana Zimanê Kurmancî ye, 46).

Ew **çawan** hat? (Kurdo, 1981: 130).

Lê **çawan** min bûyerên mezin yên jiyana mirovekî di dilê wî de dîtibûn? (Heftiyeke dirêj li Amedê, 28-29).

Ji bilî van bêjeyan ji bo pirsîna hokerên çawanîyê bêjeyên “kusa” û “kusan”ê jî tên bikaranîn ku li derûdora Herkariyê hîn jî zindî ne û di deqên kevin ên kurdîyê da jî em rastî wan tên. Bi dîtina me bikaranîna û bikarneanîna “n”yê di encama lêzedekirineke dengî da çê dibe ku li hin herêman derdikeve pêşîya me. Herçend ev hoker di nivîsarên hevçerx da neyê bikaranîn jî em ji bo zimanê nivîskî forma “kusa”yê pêşniyaz dikin.

Wamiq te **kusa** gehande ‘Ezra (Mem û Zîn, 22).

Hûn qenci dizanin em **kusan** in (Mem û Zîn, 208).

Kusa wesf û beyana te (Dîwana Weda’î, 78).

Weku jin bitin **kusan** e? (Xeberdana Zimanê Kurmancî ye, 43).

4. Pirsîna hokerên cihî bi du awayan çê dibe:

a. **Kanê/ kanî /kan/ ka**: Ev her çar jî guherteyên heman bêjeyê ne û di klasîkan da tên bikaranîn. Dema em forma wê ya soranîyê (kawa) û berbelavîya bikaranîna wê li ber çavan digirin, jib o nivîsînê “ka” bê tercîhkirin baştir e.

Kan ‘ehd û peyman a berê bê fayde çûn şubhê heba (Dîwan, 21).

Di vê taqê di vê xanê me ‘eyş û êminî **kanê** (Dîwan, 13).

Kan leşker û Ceyş û ‘heşem/ **Kanê** Cihangêrê Cihan (Dîwana Weda’î, 97).

Gelo **ka** ew egîd û fêris û mêr,

Gelo **ka** Ristemê Îranîyê min (Cigerxwîn, 1992: 157)

b. **Pêşdaçek + ku + (der)**: Îro zêdetir bi vê rêyê cihê tiştan tê pirsîn. Li gor taybetmendîya kes yan tiştê ku tê pirsîn pêşdaçekên “li, ji, bi, ber bi, di”yê tên berî bêjeyên navborî û cihê kesekî yan tiştêkî dipirsin. Hin caran ji bo sivikkirinê bêjeya “der”ê nayê bikaranîn.

Mînak: li ku (derê), ji ku (derê), ber bi ku (derê), di ku (derê) da.

Li hin dever û di hin çavkanîyan da “ku” bi guherteyên “kû” (bnr: Kurd, 1956: 108, Bedir-Xan, 1971: 30), “ko”, (bnr: devera Liceyê) “kî”yê (bnr: Kurdo, 1981: 129) bê bikaranîn jî ji bo nivîsînê divê “ku” bê tercîhkirin ku forma herî berbelav û cihgirtî ye.

5. Ji bo pirsîna hokerên sedemê bêjeyên pirsyarî yên mîna “çira”, “çima” û “ji ber çi”yê tên bikaranîn.

Em nizanin tu **çira** her we dinalî şeb û roz (Dîwan, 105).

Ez dê **çima** hêdî bim (Feqiyê Teyran, 160).

Bavê ji te **ji ber çi** nayê?

ENCAM

Mijara hokeran hem di rêzimanê da hem jî di rênivîsê da bi başî nehatîye vekolîn û xebatên bihûrgilî li ser nehatine kirin. Di vê xebatê da me di çarçoveya binbeşên sereke yê hokeran da hem awayên pêkhatina wan hem jî awayên rênivîsa wan vekolan û li ser wan raya xwe derbirî. Piştî vê vekolînê em gihîştin vê encamê ku peywendîya hokeran û daçekan, bikaranîna gireyên tewangê di gel hokeran, ketin yan zêdebûna dangan, hebûna paşgirên hokerçêker, ketina pêşdaçekên berî hokeran, pevnivîsîn û cudanivîsîna hokerên lêkdayî di awayê rênivîsa wan da roleke sereke dilîzin.

Herçend hoker di nav bêjeyên neguherbar da bên destnîşankirin jî ji ber hokarên arkaîk yan jî têkilîya wan a xurt di gel daçekan di nav destebêjeyên hokerî da awayên wan ên tewandî jî çê dibin. Lê divê mirov bibêje ku ev awayên awarte hokeran ji taybetmendîya wan a neguherbarîyê dûr naxin, lewra hokerên tewandî ne ji ber rêzika tewangê, ji ber bikarneanîna pêşdaçek û bazinedaçekan bi awayê tewandî tîn bikaranîn. Jixwe heman hoker bi tu awayî di forma xwerû da nayên bikaranîn û herwek bêjeyên guherbar li gor rewşa tewangê naguherin. Hokerên demê yê mîna “havînan (havîn+an), havînê (havîn+ê), wê demê, rojekê” mînakên vê yekê ne ku hertim bi awayê tewandî tîn bikaranîn. Ev bikaranîn hema bibêje di nav piranîya kurmancîaxivan da diyardeyeke cihgir e û di nivîsînê da jî bê kêşe weha tîn bikaranîn. Li hember vê, hokerên çendîtîyê yê ku paşgira “-ek”ê digirin ji alîyê wergirtina gireyên tewangê ve li gor herêm û bikarhêneran diguherin û bi çend awayên cîyawaz tîn bikaranîn. Ev hokerên ku di klasîkan da bi giştî bi awayê xwerû tîn bikaranîn li hin herêman bi awayê xwerû, li hin herêman bi awayê tewandî, li hin herêman bi awayê têkel û li hin herêman jî di çarçoveya rêzîkên tewangê da tîn bikaranîn. Herçî yê tewandî ne, carinan di zayenda wan da jî lihevhatin çê nabe û nêrbûn û mêbûna wan tê tevlihevkirin. Ji ber vê aloziyê, em pêşniyaz dikin ku li ser rêbaza klasîkan hokerên mîna “gelek, hinek, piçek, qurtek, qederek...”ê li her cihî bi awayê xwerû bîn bikaranîn û ev awa dê ji bo hêsankirina bikaranînê baştir be.

Pêşdaçeka “bi”yê di çêkirina destebêjeyên hokerî da bi awayekî çalak tê bikaranîn. Herçend ev daçek dema dibe beşeke hokeran piranîya bêjeyên piştî xwe natewîne jî di hin rewşên awarte da wan ditewîne. Ev daçek dema di gel hokerên demê û çawanîyê tê bikaranîn herwek “bi şev” û “bi dil”ê bi giştî bêjeyên piştî xwe natewîne. Lê ji bo çêkirina hin manayên taybetî carinan bêjeyên piştî xwe ditewîne ku hokerên mîna “bi şevan, bi otobusê, bi şertekî...” mînakên vê ne. Ji bilî vê, di pêkanîna hokerên cihî da jî roleke berbiçav a daçekan heye û gelek caran navdêr, cihnav û rengdêr di gel pêşdaçek û bazinedaçekan bi hev ra dibin hokerên cihî. Di van destebêjeyên hokerî da ji ber taybetmendîyên xwe yê cureyî daçekên navdêrî û rengdêr piştî pêşdaçekan yan di nav bazinedaçekan da nayên tewandin lê navdêr û cihnav tîn tewandin û ji hev cuda tîn nivîsîn. Di vê kategorîyê da dema pêşdaçeka bazinedaçekê bikeve herwek hokerên “dûra, piştra...”yê paşdaçek bi daçeka navdêrî ra tîn nivîsîn û serederîya yek bêjeyê bi wan tê kirin.

Diyardeya fonetîk jî di awayên nivîsîna hokeran da diyarker in. Di vê xebatê da di mijara ketina dangan da forma resen û dêrîn a bêjeyan li ber çavan hat girtin. Ev diyarde bi piranî di wan hokeran da derdikeve pêşîya me ku paşgira “-an”ê digirin û di zimanê devkî da “n”ya wan dikeve. Ji bo parastina awayê rast ê paşgirê herwek mînakên “carinan”, “ji şerman...”ê “n”ya dawî hat parastin û guherteyên “carina” û “ji şerma”yê nehatin tercîhkirin. Herçî zêdekirina dangan e dîsa ji bo parastina forma resen a bêje û gireyan ev zêdehî nehat pesendkirin û di mînaka hokerên sedemê da zêdekirina dengê “-a”yê nehat nîşandan. Di guherîna dengî da jî prensîba resenîya bêjeyan li ber çavan hat girtin. Ji ber vê jî nav gelek guherteyên hokerên nîşandanê “weha, wesa, wereng” hatin tercîhkirin. Di rewşa tesbîtnekirina resenîya bêjeyê da jî prensîba berbelavîyê li ber çavan hat girtin û di mînaka “li ku/ li kû/ li ko”yê û “kengê/ kengî”yê da awayên herî berbelav di zimanê nivîsînê da hatin tercîhkirin ku ew jî “li ku” û “kengê” ne.

Di encama vekolîna me da derket ku tenê “-kî” û “-ka” wek paşgirên taybet bi hokeran di kurmancîyê da tîn bikaranîn. Herçend paşgira “-ane”yê di hin hokeran da bê bikaranîn jî ji ber ku ev bêje wek rengdêr jî tîn bikaranîn ev paşgir ne taybet e bi hokeran. Lê paşgirên “-kî” û “-ka”yê tenê di hokeran da derdikevin pêşîya me û mirov dikare bibêje ku ev her du paşgir tekane morfemên hokerçêker in ku bûne taybetmendîyên morfolojîk ên vê pola bêjeyan. Di mînaka hin hokerên demê da gireyên tewangê jî (-ê, -î, -an) roleke morfolojîk digirin ser xwe. Lê ev gire, ne bi fonksîyona xwe ya tewangê, bi rola xwe ya manayî erkeke weha digirin ser xwe.

Herî dawî pevnivîsîn û cuda nivîsîn jî wek kêşeyeke giring a nivîsîna hokeran hat destnîşankirin, lewra hoker gelek caran bi rêya pevgerêdana komek bêjeyên mîna daçek, rengdêr, cihnav, rader û navdêran pêk tîn û di zimanê nivîskî da wek lihevhatineke giştî û berbelav hemû bêjeyên hokerên weha cuda tîn nivîsîn. Ji bilî van hokerên destebêjeyî, hokerên ku ji dubarekirina heman bêjeyê pêk tîn çî bi arîkariya gihanekekê çî jî bê gihaneke ji hev cuda tîn nivîsîn. Lê eger di navbera van bêjeyên dubare da navbergirên “-a, -e, -an”ê (beraber, rasterast, seranser) bîn bikaranîn yan jî di dawîya bêjeya dawî da paşgira “-an”ê bê bikaranîn (carcaran) ev bêje bi hev ve tîn nivîsîn. Ji bilî vana hokerên lêkdayî yê ku ji alîyê dengî û manayî ve di nav hev da dikelijin bi hev ve tîn nivîsîn ku “weha, wesa, welê, hosa, halo, holê, yekcar, yekser, têkda...” mînakên vê ne.

ÇAVANÎ

- Alî Bedir Xan, C. – Lescot, R. (2004). *Kürtçe Gramer*. İstanbul: Avesta.
- Aydogan, M. (2012). *Rêbera Rastnivîsînê*. İstanbul: Weşanxaneyê Rûpelê.
- Badıllı, K. (1965). *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*. Ankara: Ankara Basım ve Ciltevi.
- Bahoz Baran (2018). *Rêzimana Kurmancî*. Amed: Weşanên Wardozê.
- Bedir-xan, Q. A. (1932). Di Dora Hevxiştina Zmanan de. *Hawar*. 3, 1-2.
- Bedir-Xan, Q. A. (1932). Leylana Rastiyê. *Hawar*. 10, 1-2.
- Bedir-Xan, Q. A. (1933). Eyloyê Pîr. *Hawar*. 21, 1-4.
- Bedir-Xan, C. (1941). Bingeheên Gramêra Kurdmancî 2. *Hawar*. 28, 9-13.
- Bedir-Xan, K. (1971). *Rêzana Zmanê Kurdî*. Paris.
- Bülbül, M. – Öztürk, M. (2019). *Tûhfetu 'l Xîlan fî Zimanê Kurdan*. İstanbul: Weşanên Weqfa Mezopotamyayê.
- Bülbül, M. – Öztürk, M. (2022). *Berhema Mela Mehmûdê Bazîdî, Xeberdana Zimanê Kurmancî ye*. İstanbul: Weşanên Weqfa Mezopotamyayê.
- Cewerî, F. (2014). *Lehî*. İstanbul: Avesta.
- Cigerxwîn (1992). *Dîwana Yekan – Sewra Azadî*. İstanbul: Weşanxana Deng.
- Ciwan, M. (1992). *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi*. Sweden: Jîna Nû.
- Cizîrî, M. (2010). *Dîwan*. S. Dilovan (Amad.). Stenbol: Nûbihar.
- Cîhanî, P (2019). *Alole*. Ankara: Sîtav Yayınları.
- Hirofî, S. (1996). *Kurê Zinarê Serbilind*. Sweden: Nûdem.
- Kaval, M. (1989). Bêjeyên ku cihan nîşan didin. *Kurmancî*. 4, 30.
- Kurd, R. (1956). *Rêziman a Ziman ê Kurmancî*. Çapxane ya Kerem.
- Kurdo, Q. (1981). *Zimanê Kurdî Rêziman*. Frankfurt: Weşanên Komkar.
- Kurdo, Q. (2021). *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*. Z. Ergün (Wer.) (Çapa Duyem). İstanbul: Nûbihar.
- Komîsyon (2012). *Ji bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmancî) – Tirkî*. M. Malmîsanîj (Amadekar). İstanbul: Rûpel.
- Komxebata Kurmanciyê (2019). *Rêbera Rastnivîsînê*. İstanbul: Weqfa Mezopotamyayê.
- Mihemed, M. (1976). Rênûsî Korr. *Govarî Korri Zanyarî Kurd*. Bergî 4, 232-288.
- Nebez, C. (2008). *Wişanamekî Êtîmolojîyê Zimanî Kurdî*. Malperî Kurdbûn:www. Kurdbun.de.
- Nivîsanoq (1933). Heyîneqe Yeksalî. *Hawar*. 20, 1-3.
- Qewlê Newala Sîsebanê (2012). A. Demir (Amadekar û Tîpguhêz). İstanbul: Nûbihar.
- Sadîni, M. X. (2003). *Feqiyê Teyran*. İstanbul: Nûbihar.
- Sivrioğlu, T. (2015). *Avesta Dili Grameri ve Etimolojik Sözlüğü*. İstanbul: Avesta.
- Siyahpoş (2006). *Seyf-ul Milûk û Melke Xatûn*. Bedirxan Amedî (Berhevkar û Tîpguhêz). İstanbul: Nûbihar.
- Tan, S. (2005). *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Uzun, M. (1987). *Mirina Kalekî Rind*. Stockholm: Orfeus.
- Uzun, M. (2003). *Hawara Dicleyê 2*. İstanbul: Avesta.
- Weda'î (2012). *Dîwana Weda 'î*. S. Dêreşî (vejandin). İstanbul: Nûbihar.
- Xanî, E. (2022). *Mem û Zîn*. H. Zana (Amadekar) (Çapa 6ê). İstanbul: Nûbihar.
- Zaxoyî, Î. R. (1998). *Rêzman a Kurdî*. Dihok.
- Zêrevan, A. (1997). *Bingeheên rastnivîsandina kurdiyê (kurmancî)*. Stockholm: Nefel.
- Zilan, R. (1990). Li ser rastnivîsîna çend tiştan. *Kurmancî*. 7, 50-51.

Extended Abstract

Determining the spelling rules of a language is one of the important elements of language planning for the standardization of that language. This issue is still an ongoing process in Kurmanji Kurdish and it is useful to know that there are many issues that have not been addressed yet. The formation and writing styles of adverbs and adverbial phrases are one of these issues and have not been discussed properly. Although three different spelling guide studies have been carried out so far, for some unknown reason this issue has been ignored and no solution has been found to the confusion in this area. The same situation is seen in published grammar studies, where it is seen that the adverbs of Kurmanji Kurdish are not determined properly and this issue is handled in a cursory manner.

In this study, we inventoried the adverbs in Kurmanji Kurdish under the subheadings of time adverbs, quantity adverbs, quality adverbs, demonstrative adverbs, place adverbs, reason adverbs, negation adverbs, emphasis adverbs and interrogative adverbs, and we also focused on their formation and writing styles. It is worth noting that while doing all these, we benefited from old and new sources that form the corpus of Kurmanji Kurdish and took regional and dialectal differences into consideration. In this context, after identifying the different writing styles of each envelope type, we presented our own solution suggestions in order to determine the standard usage in the written language.

Although twisting is one of the important grammatical features of Kurdish, as it is known by experts in this field, it is among the bendable words of only nouns and some pronouns and adjectives. Although adverbs are among the uninflected word types, some adverbs are used in inflected form when used with prepositions among adverbial phrases. We think that the inflected forms of such adverbs were used due to the loss of these prepositions over time. This situation causes confusion, especially in the use of adverbs of time and adverbs of quantity, and after the dropping of prepositions, inflective suffixes continue to be used in some dialects, while they are not used in others. These regional and oral differences are somehow reflected in the written language. In addition, it is seen that those who use the inflection suffix in such adverbs sometimes disagree about the masculine and feminine character of the words. While we argue that adverbs of time such as “şevêkê, salekê, meanê”, which are widely agreed upon in such adverbs, should be used in inflected form, we also recommend that adverbs of quantity such as “gelek, hinek, qurtek”, which have three or four different uses, should be used in their uninflected form.

In addition to the use of singular inflective suffixes with adverbs, the plural inflective suffix “-an” is also frequently used with adverbs. While this suffix is used with these adverbs due to the use of front prepositions in some adverbs, as seen in the examples of “havînan, duseman, êvaran”, we see that in the examples of “carinan, caran, paşan” it is used to derive new adverbs by changing the meaning of the adverbs as a construction suffix, moving away from the inflection feature. As a result, it should be noted that although inflected suffixes are used with some adverbs, these adverbs are not classified as inflected words and such uses turn into a morphological feature of adverbs.

Compared to other prepositions, the preposition “bi” is used more actively in the formation of Kurdish adverbial phrases. Although this preposition used in the construction of adverbial phrases does not generally bend the word that follows it, it should be noted that it bends the word that comes after it in the formation of some special meanings. This issue arises entirely from the meaning and does not violate the general rule stated above. Prepositions are important components that form adverbial phrases. It is seen that prepositions and postpositions are used actively, especially in the formation of adverbs of place. While the prepositions used in place adverbs do not inflect the noun-derived prepositions and adjectives that follow them due to their generic properties, they inflect nouns and pronouns. Although front and back prepositions are written separately as a general rule, if the front prepositions are dropped, the post prepositions are written adjacent to the word before them, as seen in the examples of “dûra, piştra, wêda”.

Sound changes also appear as an important issue in the writing of adverbs. In such cases, if the original version of the word or suffix is known, we think that the sound change should not be shown in the written language. We also demonstrated this approach through demonstrative adverbs such as “weha, wesa, wereng”, whose origin we identified and which have different variants. Likewise, extra sounds added regionally for various reasons should not be shown in the text. On the other hand, its origins are not clearly identified; However, when writing adverbs with different variants, it would be correct to take the principle of common usage as basis and choose the forms most commonly used in the written language.

When we consider the adverb inventory of Kurmanji Kurdish, it is necessary to know that only the suffixes “-kî” and “-ka” are specific to adverbs, but in some special cases, inflection suffixes also become a morphological feature of adverbs. However, it is also worth noting that when these suffixes are used with adverbs, they lose their twisting properties.

Finally, in writing compound adverbs, if the words forming the compound adverbs are the repetition of the same word or the same words formed with the help of any conjunction or preposition, these adverbs must be written separately; However, we argue that repetition adverbs formed with the help of interfixes such as “-a, -e, -an” and with the suffix “-an” at the end should be written adjacently. In addition to these repetition adverbs, we also recommend that compound adverbs that are fused in sound and meaning should be written adjacently.